

zarokno, bi zimanê xwe bixwînin û binivîsin!

KULÎLK

kurdiska elevernas barntidning

KOVARA ZAROKÊN KURD YÊN ŞAGIRT



Hejmar: 42

**HÊJE MÊJE
EMÊ NUHA ÇEND
ÇÎROK Û MESELÊN XWE
JI WE RE BÊJIN**

Kuîlk

Sal: 1990

Nameyên Xwendevanan

Roj baş kek!

29.06.90

Erêvan

Dê û bavê min, Nûra cewarî û Tosinê Reşît tevî xwe Kovara "Kulîlk" anîbûn. Ew kovar bi min pir xweş hat.

Ez li Erêvanê di Akademiya Muzîkê de dixwînim û dixwazim li ser sazbandiya kurdî mijûl bibim. Ev çend sal in, ku ez tevî dê û bavê xwe stranên kurdî yên geleri berev dikim û min hinek ji wan bi nota nivîsîne. Di sala 1986-a de, em çûbûn Qazaxistanê û min li gundê kuedayê Qeşqebilaxê ji dengbêja bi marîfet Xanima Filît weke bîst stran nivîsîn. Ew stran gelekî xweş in. Min tekst û notayên wan nivîsiye.

Ez niha neh stranan ji wan bona kovara Kulîlkê dişînim. Eger hûn hêja bibînin, di kovarê de çap bikin. Ez timî amademe, ku xizmeta kovara Kulîlk bikim. Eger tiştek pêwîst be, ji kerema xwe re ji min re binivîsin.

De bi xaterê we, bi xwestinên herî baş.

Zozan Ozmanî

MIRÎYÊ DEH PERA

Berhevkar: **Bavê Hêvî**

Dibê carekê du zilam hebûn. Yek ji wan bajarî bû û yê din kurmanc bû. Navê yê bajarî Suphî û yê kurman jî Hemo bû. Herdu bûn desbirakê hev û daketin beriya Mêrdînê ji xwe re li karekî digeriyan. Li gundê Salikê li malek xewle bûn mêvan. Piştî şivê, herdu destbirak bi mazûbanê xwe re berê xwe dan oda Hecî Hadî.

Li oda Hecî Hadî wek her şev civat baş geriya bû. Navmaliyê Hecî Qahwa tahl li gundiyan digerand û ji dûxana cixaran mijek tenik xwe bera ser civatê da bû. Her sê zilaman silav li civatê kir, çend kes ji rêza pêşiyê rabûn û cih dan wan. Hacî Hadî xêrhatin di wan de hilda û ji mazûbanê wan Êso pirsî:

- Êso! Ma ev camêrên xerîb ji ku ne?
- Yek ji wan bajarî ye û camêrê din ji Hêşeriyê ye û ji xwe re li karekî digerin.

Axa ji wan pirsî:

- Gelî camêran ma çi kar ji destên we tê?
Yê bajarî got:

- Axayê min, ez dikarim hewsê bimalim.

Hemo jî got:

- Ez benî, weleh min bi sala gavantî kiriye. Eger gavanek ji we re lazim be, bawer bikî ez nayê mîna min zahmet tê dîtîn.

- Baş e. Lê bazarek min heye; Roja we her yekî bi nîv qurîşî û yek ji we rêxa çêlekê bavêje û yê din jî bila her ber çêlekê.

Bazar hat qebûl kirin û sohbeta civatê bi serpêhatî û pêkenînên gundiyan berde-wam kir.

Serê sibê Hemo çêlek ji êxur derxist û berê wê da çolê. Suphî jî rahişt bêrê, selikê û melkesê û daket êxur. Çi bibîne! Axur he-ta ber beşta tije zibil e. Qudûmê wî şikest û baweriya xwe pê anî, ku bi kişandinê ev kar naqede. Lê tev li vî hawî jî mecbûr bû, ku dest bi kişandinê bike.

Rewşa Hemo ji ya wî ne xweştir bû; Ohoo ohoo ya wî bû û li dû çêlekê dibezîya. Lê, fikir û nedikir ne digîhaşt wê. Di Pirmîrê re, di gundê Hecî Elî re, di Şêxê Reş re û di Kilêbînê re vegeriya Girbeşkê û hat Sa-likê...Mêrik ji betilîbûna ji hal de ketibû, Xwêdanê di pişta wî re avêtibû, ziman di devê wî de zuha bûbû û xweziya xwe bi zo-rê dadiqurtand. Wî di dilê xwe de got: "Ez



www.ksars.org

ê sibê yê bajarî bişînim ber çêlekê." Suphî jî di dilê xwe de weha di got: "Ez ê birakê xwe Hemo di ber vê rêxê xim, bila ew jî ji vê xêr û berkêta ku ez tê de mamim bê par nemîne."

Bi êvarî re Hemo çêlek di ber de û ket devê deriyê hewşê. Suphî bazda pêşiya wî û jê pirsî:

- Birako! Ma karê te çawa bû ? Tu pir betilî xuya ye.

- Na weleh. Bi serê te ez xenê bûm. Li wan mêrgan û li ber wan çeman ez di xêra xwedê de mabûm. Ma gelo tu di çi halî de bû ? Suphî di bin simêla de dikeniya û li birakê xwe vegerand:

- Weleh, ez wek tiralên Bexdayê rûniştim heta niha û min tu kar nekîr.

Hemo jê re got:

- Baş e, birako. Ez ê sibê jî herim ber vê çêlekê. Lê dusib dora te ye.

Wî bi vî awayî dixwest, ku Suphî bêtir lê sor bike. Gava ku Suphî ev gotin bihîst, di dilê xwe de got: "Ahaa, bi xwedê fîrset dike ji destên min here. Çavê vî kuçikbavî lê ye, ku ez sibê jî di nav vê rêxê de vegevizim. "Loma jî, bi dengê berger ji Hemo re got:



- Na, bi serê te yê delal, ez tu carî wanî qe-
bûl nakim. Ez di vî hundirî de, ji bêkariyê
aciz bûm. Tu jî hinekî betilî xuya ye. Tu si-
bê ji xwe re heta êvarî li ber siya êxur pal-
de. Divê ez jî hinekî kar bikim. Ma em
birakê hevdu yên çî nin ?



Hemo weke yekî ku dilê wî bi Suphî biş-
wite û bixwaze qencyakê pê bike got:

- Baş e. Lê, Başbazirganê salê wê sibê bê
ser kaniyê. Kaniyak li vê jorê ye. Min soz
daye wî ku ez ê barek êzing li piştî xwe bi-
kim û jê re bibim. Ew jî wê zêrekî bide
min. Roja me her yekî bi nîv qurişî ye. Bi
vî perî em ê çî xweliyê li serê xwe kin. Eger
tê vê soza ku min daye baş bazirgan bi cih
bîne, xem nake, wê gavê tu dikarî sibê he-
re ber çêlekê.


Serê sibê, Suphî li derdora hewşê geriya,
lê tu êzing nedît. Gazî hevalê xwe kir û
rewş jê re îzah kir. Hevalê wî got:


- Lawo, Suphî! Ka tu êzing nexuyane. Eger
em êzingan ya jî di dewsa wan de tişteki
şewatê negihênin Başbazirgan, divê em wî
zêrî ji bîr bikin. Ya baş ev e, bê ku kes me
bibîne, tu dikarî deriyê hewşê ji ber bikî û
ez ê bi werîsekî li piştî te bijdînim.

(Dûmahîk heye)











Dirê car din diranan bişom...



Ku Baxî were ezê diranên xwe rêbidimê



Diqim ba Max û Baxî

Bi ku da?



Tu pir zû hat.

Ez bo....



Erê...bo çi?

Bavê te doktorê dirana ye.



Erê! Derdê te çi ye?

Ez dixwazim diranên xwe rê bavê te bidim.



Roger! Ma xêrê!

Ez ji bo diranên xwe hatime...

EW DÊŞIN...



Derbês be û derdê xwe baje.



QUNCIKA
BAJARÊN KURDISTANÊ

AMED (DIYARBEKIR) - 3 -

RÛNIŞTEVAN:

Li gorî hejmartina 1975-an de, rûniştevanên vê wîlayetê 575283 ye. Nava bajêr 170000 bû. Lê nûha rûniştevanên nav bajêr tenê digêje 400000 î.

Ji bo ku cîhên kar kêmin û bêkarî pire, gelik mirov koçî metropolê dikan. Deherin Stenbolê, îzmîrê, Edenê...Li van bajaran taxên Diyarbekirya, Mêrdînîya ûhw ava bû ne.

Li diyarbekir rêya trêne heye. Xeta Haydarpaşa - Kurtalan di vê derê re derbas dibe. Rêyên bi bajarên din ve tîr girêdan baş in. Di nabêna Diyarbekir û Ankara -Stenbolê de, belafir jî heye.

TURÎZM:

Li ser rêya Diyarbekir û Gencê şikeftên Bîpkileyên gelek bi nav û deng in. Ava Bîrkileyên jî van şikeftan derdikevin. Tarîxa wan şikeftan gelek kevn e û hêjayê, ku mirov wan bibîne.

Diyarbekir bi keleh û mizgeftên (camî) xwe pir bi nav û deng e. Di pê keleha Çînê, keleha herî mezin e. Tarîxa avabûna kelehê ne aşîkar e. Keleha hundur û keleha ji derve heye. Dirêjbûna sûran zêdeyî 5 km. ye. Firehiya sûran di nav 3 û 5 metroyan tê guhertin. Di sûran de 82 birc û 4 derî heye.

Keleha Eilê: Ew keleha berî mîladê bi 800 salî ji alî Asûrîyan hatiye avakirin.

Keleha Atakê 15 km. derveyî Hêzanê dikeve. Nêzî Licê keleha Zulqerneyn û keleha silîva jî, kelehên gelek kevn in.

Mizgefta herî mezin û ya bi nav û deng, mizgefta Ulucamî ye. Li Kurdîstanê mizgefta herî kevnare ev e. Di nav mislimana de Harema şerîf ya 5 an tê zanîn. Ev mizgefta berê dêr bû. Di sala 1092-an de ji alî Melîk şah hatiye restore kirin.

Mizgefta Elî Paşa û Mizgefta Behrem Paşa jî, mîmarê bi nav û deng Mîmar Sînan avakirî ye. Di nav salên 1564 û 1572 an de hatin avakirin. Ji bê wan mizgeftanan, gelek mizgeftê din jî henin: wek Mizgefta Fatîh Paşa, Mizgefta Nebî, Husrew Paşa, îskender Paşa, Melîk Ahmed Paşa, Nasûh Paşa,...

Ji derveyî mizgeftan gelek pir û malên kevnare li Diyarbekir û derdora wê heye. Pira Mala Badê ya herî bi nav û deng e. Di dema ku

hate avakirin, pirek wiha kemberê wê mezin ne li Anadolê û ne jî li Balkana hebû.

Li vê herêmê gelek avgerm jî henin. Ya herî bi nav û deng avgerma Çêrmûkê ye. Ev avgerma 3 km. dûrî Çêrmûkê ye. Dibên ev avgerma ji bo gelek nexweşîyan derman e. Bi piranî ji bo bavîbûnê pir kes diherin vê avgermê. Li nêzîkî Hênê jî, ava Ankarîs heye û ji bo zerikê gelek baş e.

FOLKLOR:

Folklor a Diyarbekir gelek dewlemend de. Lîstikên bi piranî tên lîstin govend, çepik, esmer, delîlo, tîk, giranî, lorkê û çeçanê ye.

Li Diyarbekir, pîrek bi kofî û zubûn in. Kofiya didin serê xwe û navê kirasê wan jî zubûn e. Zilam, bi piranî gomlegên sipî û şelweran li xwe dikin. Li ser gomlekan êlek li xwe dikin û li nava xwe jî piştiyê girêdidin.

Sitranên Diyarbekir, ev folklor a dewlemend zengîntir dike. Ji ber welatê me ne serbixwe ye û di radyo û televizyonê kurdî qedexe ye, hinek dengbêj wan werdigerînin tirkî. Bê ku muzîka wê zêde bigherîne, bes gotinê wan dikin tirkî û di radyo û televizyonê wan distirên. Denbêjên herî tê nasîn bî eslê xwe kurd in, lê bi tirkî distirên.

TRAFÎK

Trafîk di dema me de, di jiyana mirovatiyê de cihekî pir girîng digre. Eger mirov ne xwediye zanebûnek têr be, wê trafîk wek feqek vedayî li bêşiya me be. Ji bo trafîk nebe feqek vedayî li pêşiya wan, divê her mirov zimanê trafîkê hîn bibe.

Gelo, zimanê trafîkê çi ye? Wek mînak ; Zimanê trafîkê lampe ye. Gava sor be mirov disekine û derbasbûn qedexe ye. Gava zer be, divê mirov ji derbasbûnê re amade be û kesk destûra derbasbûnê ye. Zimanê trafîkê lewhên li kêleka rê ne. Dema ku mirov li ser rêya bajarekî de be, bi alîkariya wan dizane ku çend km maye, restorant, qulûba telefonê û benzînxane li ku heye. Dîsa, bi alîkariya wan lewhan û îşaretên li ser rêyan, mirov dizane ku li ku destûra zivirandina rastê an jî çepê heye.

Dema mirov ji aliyakî rê derbasî aliyê din bibe, divê pir baldar be. Eger lampe hebe, heta nebe kesk derbasbûn qedexe ye. Eger lampe tune be; Berê li ser milê çepê, dûre li ser milê rastê û cara talî carek din li ser milê çepê binere. Eger tu erebe li ser rê tune be, wê gavê mirov dikare bê ku têkeve tu şika derbasî aliyê din bibe.

TRAFÎK



Tu çî Li min mêze dike bêmirad. Min jî te re
ne got, ku em bîfirin!

RİYA RAST BİBİNİN



Quncika Matematîkê

1) Rojvan 8 lampe kirî. Her lampak bi 3 krona bû. Wî 50 kron da dikandar. Gelo, dikandar wê çiqasî pajde bide wî?

Bersîv:

2) Bavê Delal ji bo mesrefê 300 kron da diya wê. Diya Delal dihere dikanê. Li dikanê kg a sêva bi 11 krona, ya tirî bi 17 krona û ya hinarra jî bi 19 krona bû. Wê 3 kg sêv, 4 kg tirî û 2 kg hinar kirî. Gelo çiqas perê wê ma?

Bersîv:

3) Kg a goşt bi 46 krona ye. Di kartonekê de 16 kg goşt heye. Du karton goşt çiqas pere dikin?

Bersîv:

4) Şêrgo di pîzaxanakê de rojê 10 saetan kar dike. Saeta wî bi 35 krona ye. Gelo, Şêrgo di mehekê de çend saetan kar dike û çiqas pere distîne?

Bersîv:

HÊŞÎNAHÎ - SEWZÎ

kurdi	tirki	fransizi	ingilizi
bamiye enginar, neynokên bûkê xerdel meroje, kiling garis lazût, gilgilê Stembole, garisê Stembole. genimê şamê, genimok, rewas, rûbes îspanax, silqok, siyele kari, kuvark, kumik, fiqerojk, karkulîk, karok tûzik tolik rihan pûng kereng nane, pûjan catiri sîrik sîrim	bamya enginar hardal kuş konmaz darı mısır ravent îspanak mantar ebegümeci fesleğen yarpuz kenger nane kekik yabani sarmısak	gambas artichaut moutarde asperge millet mais rhubarbe épinard champignon cresson mauve basilic menthe sauvage nane marjolaine ciboulette civette	artichoke mustard asparagus millet Indian corn, corn rhubarb spinach mushroom watercress mallow basil spearmint mint marjoram chive

EZ KÎ ME ?




Ez ji penêr pir hez dikim.

Simêlê min hene.

Ji pisîka jî pir ditirsim.

Ez kî me ?





64-83. DEST	EL	MAIN	HAND
64. tiliya mezin, tiliya beranê	baş parmak	pouce	thumb
65. tiliya nişandanê	işaret parmağı	index	index finger
66. tiliya navîn, tiliya dirêj	orta parmağı	majeur	middle finger
67. babelîçk, tiliya gustilkê	yüzük parmak	annulaire	ring finger
68. qiliçk, tiliya biçûk	serçe parmak	auriculaire	little finger
69.		bord radial de la main	radial side of the hand
70. teniştâ dest		bord cubital de la main	ulnar side of the hand
71. hevêsa dest, kefa dest	el ayası	paume	palm of the hand
72-74. xêzikên dest	el çizgileri	lignes de la main	lines of hand
75. gurçika dest, nermika dest	tenar	éminence thénar	ball of the thumb
76. qevdika dest, bazinê dest	bilek	poignet	wrist
77. movikên tiliyan	parmak kemikleri	phalanges	phalanx
78. gûpika tiliyê	parmak ucunun tırnaksız etli yanı	pulpe de la phalange	finger pad
79. sertilî	parmak ucu	bout de doigt	fingertip
80. neynûk	tırnak	ongle	nail
81. spîka neynûkê	akçıyay, lunula	lunule	lunule of the nail
82. girêkên dest	el düğümleri	noeuds de l'articulation	knuckles
83. piştdest	el sırtı	dos de la main	back of the hand

(KURMANCÎ)

PÊZANÎN

1) Qesra spî bê derî.

Ew çi ye?

Bersîv:

2) Hêstira Qero li bendero,

Ne gur dixwe, ne diz dibe.

Ew çi ye?

Bersîv:

3) Tişteki min heye,

Xuşka mine hilgustan,

Çil dergûşê ser destan,

Ne bere û ne bîstan.

Ew çi ye?

Bersîv:

4) Pişo pişo nêgizo,

Çû ber ava dengizo,

Ne gur dixwe ne dizo.

Ew çi ye?

Bersîv:

VAN HEJMARAN YEKO YEKO BIGHININ HEV



XAÇEPIRS

The crossword puzzle grid consists of the following numbered squares:

- 1: 1 square, vertical, top.
- 2: 5 squares, horizontal, row 2, column 3.
- 3: 4 squares, horizontal, row 3, column 1.
- 4: 3 squares, horizontal, row 4, column 3.
- 5: 4 squares, horizontal, row 5, column 1.
- 6: 1 square, vertical, column 3, row 4.

The grid is intersected by a vertical column of 10 squares, starting from the 3rd row and ending at the 12th row. The 6th square of this column is the 6th letter of the word 'XAÇEPIRS'.

Illustrations of fruits are provided for each number:

- 1: Three dark, round fruits (possibly plums or small apples).
- 2: A single slice of a watermelon.
- 3: A bunch of dark grapes.
- 4: A single round apple.
- 5: A bunch of grapes with a large leaf.
- 6: A single raspberry.

QUNCIKA MUZİKÎ

Notenivîs: Zozan Ozmanî

1 Berbenî

$\text{♩} = 126$

Ber - be - nî, ber - be - nî, ber - be - nî, ber - be - nî.

1) BERBENÎ

Berbenî, berbenî, berbenî, berbenî
Berbenî, berbenî, berbenî, berbenî

Berbenî wem sê ne
Berbenî, berbenî
Berbenî wem sê ne
Berbenî, berbenî

Lawno, qîz xelkê ne
Berbenî, berbenî
Kurmo, qîz xelkê ne
Berbenî, berbenî

Berbenî wem çar in
Berbenî, berbenî
Berbenî wem çar in
Berbenî, berbenî

Lawno, qîz delal in
Berbenî, berbenî
Kurmo, qîz delal in
Berbenî, berbenî

Lawno, qîz kurmanç in
Berbenî, berbenî
Kurmo, qîz kurmanç in
Berbenî, berbenî



Berbenî em pênc in
Berbenî, berbenî
Berbenî em pênc in
Berbenî, berbenî

Berbenî em şeş in
Berbenî, berbenî
Berbenî em şeş in
Berbenî, berbenî

Lawno, qîz keleş in
Berbenî, berbenî
Kurmo, qîz keleş in
Berbenî, berbenî.

XAÇEPIRS


(41)




**KEREKÎ ME HEBÛ
Û KUNDIREKÎ ME
KERÊ ME
KUNDIRÊ ME KOT KOT

ME JÎ ÇÎROK
Û MESELÊN XWE
YÊN VÊ HEJMARÊ
JI WE RE GOT**

Kulîlk





YAN

KURDISTAN

YAN NEMAN !

UTGIVARE

KURDISTANS ARBETAR-KULTUR FÖRENING

WEŞANA KOÇ - KAK

KOMELA ÇANDA KARKERÊN KURDISTANÊ

ADRESS - NAVNÎŞAN

POSTGIRONR. 98 66 50-0

BOX 7031

163 07 SPANGA - STOCKHOLM

SWEDEN

PRIS : 15:- skr
BIHA